


# LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYE ÇEND BÛYERÊN TAWANÊN ŞER LI DIJÎ ZAROKAN

Amadekar
**AKADEMIYA JINEOLOJÎ YA ROJAVA**

Qamişlo-2026

# LI BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYE

# ÇEND BÛYERÊN TAWANÊN ŞER LI DIJÎ ZAROKAN


Amadekar

**AKADEMIYA JINEOLOJÎ YA ROJAVA**



Qamişlo-2026

**Naverok;**


- Binpêkirina Mafê Jiyanê: Qetilkirina Zarokan
- Zarokên Ku Li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Rû Bi Rû ya Pevçûnan Bune
- Bandora Koçberiya Bi Darê Zorê Û Ji Cîhûwarê Derxistin Li Ser Zarokan
- Zarokên Li Kobanî Di Bin Gefên Dorpêçê De Ne
- Di Nav Şer De Zaroken Ku Perwerde Mehrum Dimîne
- Hevpeyvîna Rêxistina Sterk a Parastin û Şopandina Mafên Zarokan
- Encam
- Wêne

# BINPÊKIRINA MAFÊ JIYANÊ: QETILKIRINA ZAROKAN

Ev rapor ji bo analîzkirina bandora êrîşên HTŞ'ê yên ku di 6'ê Çileya 2026'an de dest pê kirin li ser zarokên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi taybetî ji perspektîfeke Jineolojî ve hatiye amadekirin. Êrîşên ku rasterast an nerasterast ji aliyê HTŞ, DAIŞ û dewleta Tirkiyeyê ve têne kirin, bi awayekî sîstematîk mafên bingehîn ên zarokan, di nav de mafê jiyan, tenduristî, xwarin, stargeh,lîstîk, perwerde û rehetiya psîkolojîk, binpê kirine. Li ser bingeha şahidiyên meydanî, çavdêrî û mînakên belgekirî, rapor eşkere dike ku zarok ne tenê qurbaniyên şer in, lê di heman demê de hedefên şer in jî. Bêdengiya civaka navneteweyî û saziyan yek ji faktorên sereke ye ku dibe sedema berdewamiya van sûcan.Armanca raporê ew e ku ji nêzîkatiyên teng ên li ser ewlehiyê ku tenê şer bi rêya pevçûnên çekdarî, tevgerên eniya pêşîn û encamên leşkerî vedikolin, wêdetir biçe.Ev lêkolîn şer wekî şêweyekî piralî û sîstematîk ê tundûtûjiyê ku ji aliyê zihniyeteke baviksalar, otorîter û kolonyal ve li ser civakê tê ferzkirin, dibîne. Ev tundûtûjî ne tenê bi rêya bombe û çekan, lê di heman demê de bi rêya koçberiya bi darê zorê, revandin, rejîmeke tirsê, xizaniyê û hilweşîna têkiliyên civakî jî tê hilberandin. Encamên herî giran di beden, giyan û xeyalên pêşerojê yên zarokan de têne dîtin.Di vê çarçoveyê de, zarok ne "qurbaniyên alî" an jî qurbaniyên pasîf ên şer in. Berevajî vê, ew mijarên civakî ne ku rasterast wekî amûrek ji bo bindestkirina civakê û kontrolkirina pêşerojê têne hedefgirtin. Tundûtûjiya li dijî zarokan di heman demê de êrîşek li dijî dayikan, malbatan û tevahiya civakê ye.Şerê ku ji aliyê HTŞ ve tê meşandin, bi awayekî sîstematîk mafê jiyanê, ewlehiya fizîkî û derûnî ya zarokan, hesta aîdiyetê, mafê perwerdehiyê û têkiliyên civakî yên zarokan hedef digire. Armanca vê raporê ew e ku van binpêkirinan eşkere bike; ezmûnên zarokan ne tenê wekî trajediyek mirovî, lê di heman demê de wekî şikestinek civakî û dîrokî jî çareser bike.

Ji bo zarokan, şer ne tenê kêliyek e ku çek diaxivin; ew pêvajoyek e ku tê de tevahiya berdewamiya jiyanê tê qutkirin û ewlehî, aîdiyet û pêşeroj bi awayekî sîstematîk têne hilweşandin. Jineolojî bi tevahî nêzî jiyanê dibe, ku navenda wê li ser jinan e û li ser civakê ye. Ji vê perspektîfê ve, her êrîşek li ser zarokekî di heman demê de êrîşek li ser jinan, civakê û pêşeroja kolektîf e.Di salên dawî de, êrîşên dijwar ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê zarokan ji qurbaniyên şer ên pasîf veguherandine hedefên rasterast. Bombebaran, dorpêçkirin, koçberiya bi darê zorê û wêrankirina binesaziya tenduristî û perwerdeyê jiyana zarokan nedombar kiriye.

Zarok pêşeroja civakê ne.Her êrîşek li ser zarokan êrîşek li ser bîr û berdewamiya civakê ye. Zîhniyeta şer a baviksalar zarokan ne wekî hebûnên ku divê werin parastin, lê wekî amûrên afirandina tirsê û bindestkirina civakê dibîne.



Nakokiyên li herêmê tenê bi dînamîkên herêmî nayên ravekirin. Têkiliyên fiîlî û veşartî yên di navbera komên cîhadîst ên wekî HTŞ û DAIŞê û dewleta Tirkiyeyê de berdewamî û belavbûna êrîşan zêde kiriye. Ev hevkarî bi taybetî di hedefgirtina deverên sivîl, endezyariya demografîk û polîtîkayên koçberiya bi darê zorê de eşkere ye. Di şerê ku ji hêla vê hevpeymaniyê ve tê meşandin de zarok bûne hedefên herî bêparastin; wan rasterast bi jiyana xwe bedelên berjewendiyên leşkerî û siyasî dane.


…




**ZAROKÊN KU LI ŞÊXMEQSÛD Û EŞREFIYÊ RU BI RU PEVÇÛNAN BUNA**

Zarokên li taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiye yên Helebê çi dîtin? Wan rasterast şerên çekdarî dîtin. Wan dît ku malên wan tên hedefgirtin. Wan heta mirin û birîndarî jî wekî beşek ji jiyana rojane dîtin. Ev tê vê wateyê ku hesta ewlehiyê ya zarok bi bingehîn dihejîne. Ew hestek kûr a xerîbbûnê û têgihîştinek domdar a tehdîdê di zarok de diafirîne.

Mirin, birîndarî û revandina zarokan di dema êrîşên HTŞ de ne tenê windahiyên takekesî ne.Ew birînên ku li ser bîra(hafizaya) kolektîf a civakê hatine çêkirin in. Revandina zarokan êrîşek li ser îradeya dayik û civakê ye. Ev pêkanîn beşek ji stratejiyekê ne ku tirsê belav bikin û civakê bindest bikin. Nezelaliya ku bi saya zarokên hatine revandin çêdibe ne tenê malbatan, lê tevahiya civakê mehkûmî rewşek şîn û benda domdar dike.Çend mînakên ku zarokên hatine qetilkirin em niha dixwazin bi we re parve bikin heye. Wekî delîl wêne heman demê hevdîtinên ku malbatê wan re hatine kirin hene.

| | NAV | TEMEN | CIH | DÎROK | SÛCDAR | DELÎL |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Nûra Reşo | 10 Salî | Heleb – Şêxmeqsûd | 07.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 2 | Emîn Reşo | 8 Salî | Heleb – Şêxmeqsûd | 07.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 3 | Mîra Reşo | 3 Salî | Heleb – Şêxmeqsûd | 07.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 4 | Xoreşîd Omer | 13 Salî | Heleb – Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 5 | Sebrî Mihemed Ebdelqadêr | 8 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 6 | ? | 10 salî | Helep – Deir Hafer | 09.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Rapora SOHR |
| 7 | ? | 10 salî | Helep – Deir Hafer | 09.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Rapora SOHR |

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | Mihemmed Ebdurahman Berekat | 8 mehî | Helep - Şêxmeqsûd | 13.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne-Hevdîtîna Bi malbatê re |



Zarokên ku encamê erîşan de birîndar bûne;

| | NAV | TEMEN | CIH | DÎROK | SÛCDAR | DELÎL |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Îvan Ebdo | 2 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 2 | Şam Dilo | 3 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 3 | Hemûde Mihemed Bekir | 13 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 4 | Eslan Bekir | 15 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | Cîhad Salêh Nasêr | 15 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 6 | Ehmed Bedir Aldîn Zêdan | 15 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 7 | Abdulah Hesen Mihemed | 8 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 8 | Hela Hemze | 13 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 9 | Wîam | 6 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne-Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 10 | Rehef Hemze | 6 salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |
| 11 | Receb Ebdelfetah | 13 Salî | Heleb - Şêxmeqsûd | 06.01.2026 Erişa Bambe baranê | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne -Hevdîtin û Rapora Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Surî |



Zarokên ku wendabûne jî gelekin.Bes hejmar ji ber rewşa erîşan hîn zelal nebûye.Bes zarokek bi navê Axin ( dayîk û bav qetilbûne û axîn koçbere ) 20 rojê ye.Li Şêxmaqsûdê 08.01.2026 wenda ye.






**BANDORA KOÇBERIYA BI DARÊ ZORÊ Û JI CÎH Û WARKIRINA LI SER ZAROKÊ**

Kesên ku ji taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, her wiha ji Tebqa û Reqayê bi zorê hatine koçberkirin. Li van deveran, zarok hedefên herî bêparastin ên polîtîkayên koçberkirina bi zorê bûne. Koçberî ne tenê guhertinek cih e; ew parçekirina bîr, ziman û çanda zarokekî ye.Zarok ji perwerde, xwarin û lênêrîna tenduristiyê bêpar mane, û neçar mane ku di rewşek demkî ya herheyî de bijîn.



Zarokên ku ji Tebqayê ber bi Hesekê û Qamîşloyê ve koç dibin de em vê rewşê hîn baştir dibînin.Zarokên li ser rêyên koçberiyê bi birçîbûn, tirs û nezelaliyê re rû bi rû mane. Li wargehên nû, pirsgirêkên adaptasyonê, dûrxistin û hestên bêewlehiyê berbelav bûne.Bê war, bê lîstok, bê xwarin, bê cil mandin û di rewşen dijwar zivistanê mayîn ji bo zarokan giran e. Ji bo zarokan lîstok cîhaneke. Zarok ji lîstok û daxwaza lîstok tên dûrxîstin.




Di hevpeyvînekê de li Dibistana Seretayî ya Menav Xindo li Qamîşloyê, dayikekê hem tirs û hem jî bêçarebûna xwe anî ziman dema ku serpêhatiyên kurê xwe Osman Hemûdî vegot. Wê got ku şîdeta ku wan di rê de ji Helebê dîtiye jiyana kurê wê bêdeng kiriye. Osman 8 salî ye. Dema ku malbata wî gihîşt Tebqayê, wî dît ku seyareki hat teqandin û mirov li ber çavên wî dişewitin. Osman ji wê rojê ve neaxivîye. Dayikê diyar kir ku nexweşxane niha tenê xizmetê didin rewşên awarte û nebûna navendek piştgiriyê ku ew bikaribe kurê xwe lê bibe wan dixe nav tirs û bêhêvîtiyê. Osman, ku berê ji seyareyên pêlîstok hez dikir, niha ji wan jî ditirse. Bêdengiya Osman tenê yek ji birînên kûr e ku şer li ser beden û giyanê zarokan dihêle. Şer ne tenê malên wan, lê di heman demê de deng û xeyalên wan jî ji wan digire.



Di hevpeyvînek din de ku li heman dibistanê hatiye kirin, malbatek ji Kobaniyê ku neçar mabûn ji Rakkayê birevin.Serpêhatiya xwe bi van gotinan vegot: "Ez bi eslê xwe ji Kobaniyê me. Em ji bo dermankirina kurê xwe hatin Reqayê. Ji nişkê ve êrîş bi qîrîna 'Allahû Ekber' dest pê kirin. Her kes direviya, lê em nekarîn birevin. Ji ber ku kurê min astengdar bû."Dayikê got ku ew hîn jî bêçaretî û tirsa ku wan di wê gavê de jiyan kiriye hildigire. Wê rave kir ku komek ji YPJ di kêliya dawî de gihîştine wir, kurê wê hembêz kirin û ew xistine wesayîtekê. "Nîvê malbata min niha li Kobaniyê ye, ji hêla dijmin ve dorpêçkirî ye. Em li vir di dibistanekê de dimînin," wê got.Dayikê diyar kir ku piştî tiştê ku kurê wê jiyan kiriye, tevgera kurê wê guheriye, dema ku ditirse êrîşkar dibe û ew pir zehmet dibîne ku bi vê rewşê re mijûl bibe. Wê hevpeyvîna xwe bi gotina "Ez dixwazim wî biparêzim, lê piştgiriyek min tune.Em wekî malbat perçe bûne" bi dawî kir. Şer ne tenê ewlehiya zarokan, lê di heman demê de tenduristiya wan a derûnî jî hedef digire.







Li gorî rapora UNICEF 1,229 kes jê 298 zarok ji Şêxmeqsûd û Eşrefiye koçberê herema Cizîrê bajarê Heseke û Qamişlo bûn.



Zarokekî 13 salî ji Efrîn. Di dema koçberiyê de, ew û malbata wî gihîştin Qamîşloyê û neçar man ku li poleke Dibistana Abdelmesih Heyderî xwe biparêzin. Ji bo ku di şert û mercên dijwar ên zivistanê de germ bibin, sobeyek mazotê di polekê de hatibû sazkirin. Lêbelê, sobe teqiya, zarok bi giranî birîndar bû û ew bi lez û bez ji bo Nexweşxaneya Taybet a Sûriyeyê hate şandin. Piştî ku bi rojan ji bo jiyana xwe şer kir.Di 7’ê Sibatê de koça dawî kir. Ev bûyer ne bûyerek tenê ye; ew tenê yek ji dehan trajediyên wekhev e ku di bin şert û mercên şer, koçberî û dorpêçkirinê de têne jiyîn. Nebûna stargehek ewle, bêparkirina ji bo sotemenî û pêdiviyên bingehîn, zarokan nêzîkî mirinê dike dema ku ew ji bo jiyanê têdikoşin. Ev mirin nikarin wekî "qezayan" werin hesibandin; ew encama rasterast a koçberiya bi darê zorê, bêparî û zincîreyek îhmalkirinê ne. Û ew zarok in ku bedela herî giran didin.



# ZAROKÊN LI KOBANÎ DI BIN GEFÊN DORPÊÇÊ DE NE

Zarokên li Kobaniyê di bin dorpêçê de dijîn, bi gefên berdewam ên êrîşê mezin dibin.Zarokên li Kobaniyê, ku di bin dorpêçkirin û gefa berdewam a êrîşê de dijîn. Neçar in ku ji bo domandina jiyana xwe jiyaneke bi tirs û xofeke berdewam tehmûl bikin. Zextên leşkerî yên berdewam ên ji aliyê HTŞ'ê ve ne tenê bi êrîşên çekdarî ve sînordar in.Ew bi zanebûn şert û mercên bingehîn ên jiyana sivîlan bi rêya qutkirina av û kerbeyê jî hedef digirin. Piştî ku Bendava Tişrînê ket bin kontrola HTŞ'ê, kiryara wan a yekem qutkirina av û kerebe bû. Ev yek encamên ku jiyanê tehdît dikin, nemaze ji bo zarok û pitikan(zarokê pêçekê) hene.



Nehiştina avê bû sedema hilweşîna tevahî ya şert û mercên paqijiyê. Nexweşiyên vegirtî, îshal û pirsgirêkên tenduristiyê di nav zarokan de zêde bûn. Qutbûna kerebe xizmetên tenduristiyê felç kir, nexweşxane û beşên zayînê bêfonksiyon kirin. înkubatorên xirab, têkçûna zincîra sar û alavên bijîşkî yên nebikarhatî encamên gelekî xirap bi xwe re anî taybet ji bo pitikên nûbûyî.Nekarîna gihîştina şîr, mama (xwarina pitikan) û xwarinên bingehîn di bin şert û mercên dorpêçkirinê de bû sedema mirina zarokan ji birçîbûnê. Nebûna vebijarkên xwarinê yên alternatîf dema ku gihîştina şîrdanê qut dibû, rasterast jiyana pitikan tehdît dikir. Ev mirin ne encama karesatên xwezayî an jî bêparbûna neçar bûn.Ew encama polîtîkayên dorpêçkirinê yên bi zanebûn hatine bicîhkirin bûn.Rewş ji bo pitikên nûbûyî hîn xirabtir e. Nebûna alavên bijîşkî yên bingehîn, pêdiviyên paqijiyê û bi taybetî jî alavên oksîjenê rê li ber dermankirina pitikên ku ji têkçûna nefesê dikişînin girtiye. Heta mudaxeleyên bijîşkî yên herî bingehîn ên piştî zayînê jî nekarîn werin kirin.Mirinên ku pêşî lê dihat girtin çêbûn. Ev rewş binpêkirinek eşkere ya jiyanê di forma wê ya herî xeternak de pêk tîne. Qutkirina av, kerebe, xwarin û xizmetên tenduristiyê wekî rêbazek bêçek lê pir bi bandor a şer tê bikar anîn.Ji ber vê yekê, mirina zarok û pitikan li Kobaniyê ji krîzeke mirovî wêdetir e.Ew li gorî qanûna mirovî ya navneteweyî cezayek kolektîf û sûcên şer pêk tînin. Mafê jiyanê yê zarokan bi rêya dorpêçkirin û bêparkirinê bi awayekî sîstematîk tê binpêkirin.

Zarokên ku hatin qetilkirin;

| | NAV | TEMEN | CIH | DÎROK | SÛCDAR | DELÎL |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Sabrîn Ehemd Elawî | 8 Salî | Kobanê – gundê Qasîmîyê | 27.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne |
| 2 | ? | 10 Salî | Xanêm Elelî - Reqa | 25.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne |
| 3 | Mehmûd Mesî Alkûlik | 15 Salî | Reya Reqa - Kobanê | 18.01.2026 Erîşên Dron | Hêzên Eşîran | Wêne |
| 4 | Deham Elreşo | 10 Salî | Til Mecdel – Hesekê | 18.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne |





Zarokên ku birîndar bune,

| | NAV | TEMEN | CIH | DÎROK | SÛCDAR | DELÎL |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **1** | Cûdî Ehmed Elawî | 14 Salî | Kobanê – gundê Qasîmîyê | 27.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Heyva Sor a Kurdistanê |
| **2** | Mihemed Ehmed Elawî | 10 Salî | Kobanê – gundê Qasîmîyê | 27.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Heyva Sor a Kurdistanê |
| **3** | Ibrahîm Ehmed Elawî | 5 Salî | Kobanê – gundê Qasîmîyê | 27.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Heyva Sor a Kurdistanê |
| **4** | Cafer Mihemed Şêx Bozan | 3 Salî | Kobanê – Xerab Hişk | 26.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Heyva Sor a Kurdistanê |
| **5** | Solîn Mihemed Şêx Bozan | 7 Salî | Kobanê – Xerab Hişk | 26.01.2026 Erîşên Dron | Artêşa Sûrî Ya Demkî (HTŞ) | Wêne û Rapora Heyva Sor a Kurdistanê |





Kobanî demek dirêj e di bin dorpêçeke giran de ye; pêdiviyên bingehîn, bi taybetî sotemenî, nikarin bigihîjin bajêr. Piştî êrîşên HTŞ'ê, bi hezaran kes ji bajar, navçe û gundên derdorê neçar man ku koçî Kobanî bikin û ev zêdebûna ji nişka ve ya nifûsê krîza xanîyan kûrtir kir. Dibistan veguherî stargehên demkî û gelek malbatan malên xwe ji koçberan re vekirin; lêbelê gelek kes neçar man ku di wesayîtên xwe de an jî li kolanan bijîn. Di vê heyamê de, ku şert û mercên zivistanê yên herî dijwar hatin jiyîn, pênc zarok ji ber germkirina nebaş û nebûna mazotê cemidîn û jiyana xwe destdan û gelek zarok nexweş ketin. Kapasîteya nexweşxaneyan têrker nebûn û kêmbûna derman, kelûpelên bijîşkî nexweşiyên ji ber sermayê çêbûn hîn zêde kirin û krîza mirovî kûrtir kir.



# DI NAV ŞER DE ZAROKEN KU PERWERDE MEHRUM DIMINE

Pêvajoya ku bi êrîşên HTŞ'ê li ser taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiye yên Helebê di 6'ê Çileya 2026'an de dest pê kir, ji xeta Der Hafir heta Tebqa, Reqa, Dêr el-Zor, Hesekê, Qamîşlo, Çil Axa û Kobanî belav bû. Bi van êrîşan re, pergala perwerdehiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi bandor rawestiya.Bi taybetî li Qamîşloyê, gelek dibistan ji bo malbatên koçber veguherî stargehan. Bi girtina dibistanan, zarok ji perwerde, mamoste û rûtînên rojane hatin qutkirin. Lê dîsa jî, di şert û mercên şer de, dibistan yek ji cihên dawîn e ku zarokek dikare ji tundûtûjiya cîhana derve were parastin. Dema ku ev cîh winda bû, zarok rasterast kişand nav şer.Bi rawestandina perwerdehiyê, zarokan dest pê kir ku hemî dema xwe bi malbatên xwe re derbas bikin. Bernameyên nûçeyan ên ku bi berdewamî li malan dilîzin, wêneyên êrîşan li ser medyaya civakî û axaftinên tirsnak ên mezinan bê fîltre ketin cîhana zarokan. Zarok şer dubare kir, ne tenê li derve, lê di heman demê de li ser ekranan û bi gotinên mezinan jî. Tirsa ku ji hêla mezinan ve hatibû çandin bandorek ducarî li ser zarokan kir.Ev yek di zarokan de wekî bêdengî, vekişîn, teqînên hêrsê, tirs, pirsgirêkên xewê û nekarîna lîstinê xuya bû. Zarok neçar ma ku di rastiyek ne guncaw de bimîne.



Ev rewşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi zelalî nîşan dide ku dema dibistan digirin, ne tenê perwerde radiweste. Sînorên ku zaroktiyê diparêzin jî têne hilweşandin. Şer ji polên wane derdikeve û dikeve nav malan.




Zarok ne tenê ji dibistanên xwe hatin derxistin; wan her wiha şahidiya wê yekê kirin ku dibistanên wan rasterast hatin hedefgirtin. Wan temaşe kir ku avahiyên ku wan perwerdehiya xwe lê digirtin hatin bombebarankirin, hola wane hatin wêrankirin û hewşên dibistanan bûn deverên êrîşê. Armanckirina dibistanê di cîhana zarokan de hestek çêkir ku "tu der ewle nîne". Ji bo zarokekî, bombebarankirina dibistanekê ne tenê astengkirina perwerdeyê ye; ew hilweşandina hesta wan a ewlehiyê ye. Ev şerek e ku rasterast zaroktiyê hedef digire.




SERETAYIYA
Ş.RIFET HEC
SIRI
ابتدائية الشهيد
رفعت حاج سري





Li gorî rêveberiya perwerdehiyê ya Kobaniyê, 'perwerde ji 15’ê Çile ve hatiye rawestandin.' Piştî ku dibistan veguherî stargehan, 72,000 xwendekarên li Kobaniyê û derdora wê ji perwerdeyê bêpar mane.





## HEVPEYVÎNA RÊXISTINA STERK A PARASTIN Û ŞOPANDINA MAFÊN ZAROKAN

Julia Cengidar Xello, berdevka Rêxistina Sterk ji bo Parastin û Şopandina Mafên Zarokan, di nirxandina xwe ya li ser bandora şer li ser zarokan de tekez kir ku rewş pir giran û piralî ye.Xello diyar kir ku ew rasterast beşdarî lênêrîna zarokên ku di şer de birîndar bûne dibin û ev hewldan bi hevkariya Heyva Sor a Kurdistanê têne kirin. Wî got ku gelek zarok di dema şer de bi giranî birîndar bûne, hin ji wan dest an lingên xwe winda kirine û got, "Windahiyên fîzîkî girîng in. Lê tiştê ku herî zêde me xemgîn dike trawmaya kûr a derûniya e ku zarok dijîn."Xello diyar kir ku koçberiya bi darê zorê ji bo zarokan wêraniyek bêhempa diafirîne, û destnîşan kir ku gelek zarok di dema koçberiya bi darê zorê de, bi taybetî li Reqa û Tebqayê, winda bûne. "Niha, zarokên malbatên ku neçar mane koçî Qamîşlo û Hesekê bikin, li dibistan, mizgeft û dêran têne bicihkirin. Em ji bo zarokên li van deveran lîstikan saz dikin, hewl didin ku wan bi jiyanê ve girêbidin. Lêbelê, gelek zarok naaxivin, ew vekişiyane. Piraniya wan hîn jî di şokê de ne."Xello diyar kir ku qeydên zelal ên hejmara zarokên winda nînin û sedema sereke ya vê yekê hejmara zêde ya dozên kesên winda ye. "Gelek zarok bê malbat in an jî nikarin bi malbatên wan re têkilî daynin. Hejmara zarokên winda her roj zêde dibe."Xello bi taybetî bal kişand ser rewşa Kobaniyê û tekez kir ku zarokên li wir di bin şert û mercên pir dijwartir de ji bo jiyanê têdikoşin. "Ne derman, ne xwarin, ne av, ne jî kerebe heye. Zarok ew in ku herî zêde ji van şert û mercan bandor dibin.Xello her wiha mînakên berbiçav ên tiştên qewimîn parve kir. Wî diyar kir ku pitikek(zarokê pêçayî) nûbûyî li Nexweşxaneya Kobanî mir ji ber ku êdî lûleyên nefesê neman û di êrîşeke li ser nexweşxaneyek li taxa Şêxmeqsûd de, zarokên di hundir de ji ber zext û kêmbûna oksîjenê mirin, hin ji van zarokan tenê sê salî bûn.

Xello diyar kir ku yek ji bûyerên herî balkêş û bi êş di vîdyoyek ku ji hêla çeteyên HTŞ ve hatî weşandin de hatiye eşkerekirin û got, "Di vîdyoyê de ji zarokekî tê pirsîn, 'Tu Kurd î?' Zarok bersiv dide, 'Erê, ez Kurd im.' Ew tenê 9 salî ye û dû re tê qetilkirin. Paşê, di lêpirsîna me de, me hîn bû ku malbata zarok jî winda

ye."Julia Cengidar Xello tekez kir ku ev bûyer ne bûyerên takekesî ne û diyar kir ku zarok bi awayekî sîstematîk tên hedefgirtin û ev yek sûcekî şer ê giran e. Wê rewş bi kurtasî got, "Îro, zarok ne tenê qurbaniyên şer in; ew di heman demê de bûne hedefa siyaseteke tunekirinê ya bi zanebûn."

## ENCAM

Bandora şer li ser zarokan ne tenê bi windakirina jiyanê an birîndarbûna laşî ve sînordar e. Zarok neçar dimînin ku di hawîrdorekê de mezin bibin ku tê de jiyanek ewle, berdewamî û pêşerojek watedar bi zanebûn hatiye ji holê rakirin. Bêparbûna ji dibistanê, birçîbûn, koçberiya bi darê zorê, tirsa domdar û şîdeta şahidîkirî birînên kûr û bêçare li ser pêşkeftina derûnî û civakî ya zarokan dihêlin. Ev rewş ne rêzê ye. Ew sîstematîk û domdar e.Perspektîfa jineolojiyê bi awayekî zelal nîşan dide ku ev pêvajo di heman demê de êrîşek li ser jin û civakê ye. Ji ber ku hêza bingehîn a ku jiyana zarokan didomîne, ked, rêxistinbûna civakî û rola parastina jiyanê ya jinan e. Armanckirina zarokan qelskirina rola damezrîner a jinan di civakê de, hilweşandina jiyana kolektîf û hilweşandina avahiya civakî ya demokratîk e. Ji ber vê yekê, tiştê ku diqewime ne tenê pirsgirêkek ewlehî an leşkerî ye, lê êrîşek rasterast li ser paradîgmayekê ye.Li Bakur û Rojhilata Surî de modelek jiyanê ya li ser bingeha demokrasî, ekolojî û rizgariya jinan, parvekirin, wekhevî û jiyana hevbeş dihat parastin.Hemû sazî bes taybet saziyên ku zarokan re alaqadar dibin nifşa nû li ser vê esasê zarokan perwerde dikirin.Berevajî vê, paradîgmaya ku desthilatdarî û serdestiya mêran esas digirt ve ev erîş di 6 çilehê 2026 de hat qêwimandin.Wêranî, talankirin, koçberkirina bi darê zorê û komkujiyan diafirîne. Di vê pêvajoyê de, ne tenê ew kesên ku êrîşan pêk tînin, lê ew kesên ku bêdeng dimînin jî berpirsiyar in. Bêdengiya saziyên ku erkdar in parastina zarok, jin û jiyana sivîlan ne bêalîbûn e, lê hevkarî ye.Qirkirin qebul kirine. Bêbandorî û bêdengiya avahî û mekanîzmayên xwebexş ên ku bi darizandina tawanên şer ên navneteweyî hatine erkdarkirin nayê qebûlkirin. Ev bêdengî zemînê ji bo sûcan diafirîne û sûcdaran cesaret dike. Divê mafê jiyanê yê zarokan tavilê were parastin û pêdiviyên wan ên bingehîn, nemaze perwerde û tenduristî, werin misogerkirin. Divê sûcên şer werin belgekirin, sûcdar werin darizandin û qanûnên navneteweyî werin bicîhanîn. Bêyî xurtkirina avahiyên civaka sivîl ên ku ji hêla jinan ve têne rêvebirin û civakê diparêzin, ne mimkûn e ku zarok pêşerojek ewle bi dest bixin. Ji ber vê yekê, parastina zarokan ne tenê erkek mirovî ye; ew şertek bingehîn e ji bo parastina jiyan, civak û pêşerojê.

## Mafê jiyana zarokan di tu şerî de nikare bibe mijara danûstandinê.


HEYVA SOR A KURDISTANÊ
1993








JAC








NIKE







